
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1238 | 12-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Romana 'Vejîna li welatê rojê-Amara' bi kurdî derket




**Romana ji sê bergan a nivîskar Mehmet Saît Uçlu ê ku 29'ê adara 2021'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest da, bi navê 'Vejîna li welatê rojê-Amara' bi kurdî derket. Ev roman romana PKK'ê û têkoşîna Rêber Apo ye. Ev destpêkeke.**

Têkoşîna azadiyê ya gelê kurd zêdeyî sed sal in dewam dike. Ev têkoşîn di rêwîtiyeke zor û zehmetiyan re derbas bû. Di vê rêwîtiyê de gelek zehmetî hatin dîtin û bi ser jî ket. Lê belê li gel her cûre zehmetiyan jî ev têkoşîn mîna Dîcle û Firatê her tim ber bi deryaya azadiyê ve herikî. Ev dîrok, ev têkoşîn di vê serdemê de bi qasî ku hêjayî wê be nebû mijara wêje û hunerê. Rêber Apo girîngiyeke mezin da karê nivîsandinê. Ji ber ku nivîsandin hişekî, hişmendiyekê diafirîne. Ev hişê me hemûyan e. PKK'ê di dîroka gelê me de xwedî cihekî taybet e. Tevgera ku Rêber Apo di Newroza 1973'an de da destpêkirin, li welêt pêşengî ji bûyîneke nû re kir. PKK'ê ji bo gelê kevnar ê Mezopotamyayê bû navê jiyana nû. PKK'ê veguherî sembola berxwedan û lehengiyê. PKK'ê di rêya azadiyê de xwedî li mîrateya jin û mêr ên leheng ên dîrokê derket û di vê oxirê de fedakarî kir.

Ev têkoşîn romana destaneke ji bo eşq, heqîqet û azadiyê ye. Vejîna li welatê rojê-Amara gava destpêkê ya vê destanê ye ku ji aliyê Mehmet Saît Uçlu ve bi ked û hesasiyeteke mezin hate amadekirin. Uçlu cihê ku di pirtûkê de qala wan tê kirin gav bi gav geriya, ew atmosfer li cih hîs kir, lêkolîn kir û ev kar bi feraseta wêjeyê şoreşgerî destnîşan kir. Destpêka vê destanê bi pirtûka destpêkê û 3 bergan amade kir. Vejîna li welatê rojê-Amara romanek xeyalî ya nivîskarekî nîne. Ev yek jiyana me ye, çîroka gelê me ye. Ev yek mizgîniya vejîna nû ye. Ev roman romana PKK'ê û têkoşîna Rêber Apo ye. Ev destpêkeke. Di her beşa vê berhema ji sê bergan de em ê şahidiyê ji destpêka vê destanê re bikin.

Ev destan demeke ji tarîtiya dîrokê ronî dike. Ev berhema ji sê bergan pêk tê, balê dikişîne ser têkoşîna mayinê, berxwedan û dîroka du sed salên dawî ya gelan. Vê yekê jî bi rêya malbatekê dike. Di nava şerê bêdawî û hilweşîna demdirêj de qala têkoşîna jinûve avakirina jiyanê ya vê malbatê dike. Nivîskar bûyer û çîrokên zor û zehmetiyê yên li nava jiyana gund a mirovan mîna xelekekê digihîne hev. Her wiha qala bûyerên mezin ên raperînan dike ku di paşerojê de tevahiya dîrokê serûbin bikin. Mehmet Saît Uçlu bi sebir çîrokên trajîk ên van mirovan vediguherîne çîrokeke hêviya mirovahiyê.

Fermo, bi piştgiriya Weşanên Meyman em bi hev re ber bi paşerojê û heqîqetê ve gavê biavêjin. Bi zimanê xwe yê dayikê bi kurdî em vê heqîqetê bixwînin. Vejîna li welatê rojê-Amara ku pirtûka destpêkê ya vê destana ji sê bergan e, li hemû Navendên Civaka Kurd a Demokratîk ên li Ewropayê, standên festîval û çalakiyan, her wiha li ser malperên meyman.org û pirtukxane.net dikare bê peydakirin.

# SZK'yê 'Zimannasîya Teorîk' çap kir




Pirtûka "Zimannasîya Teorîk" ji nav weşanên SZK'yê derket.

Berhema "Zimannasîya Teorîk" a Ebdilselam Necmedîn û Şêrzad Sebrî Elî, ji nav weşanên Sazîya Zimanê Kurdî (SZK) derket. Ev berhem ku ji hêla SZK'yê ve hatîye latînîkirin, bi tîpên erebî (bi zaravayê behdînî) hatibû nivîsîn û sala 2011'an ji nav Weşanxaneya Spîrêzê derketibû.

Di danasîna pirtûkê de ev tişt hatine gotin; "Di vê pirtûkê da, tevî astên zimanî, şaxên zimannasîyê, mijarên mîna têgiha zimanî, erkên zimanî, guherîna zimanî, cudahîya zimannasîyê û rêzimana klasîk hatine şîrovekirin. Di prosesa lêanînê de, me hewl daye ku vê berhemê li kurmancîya standart biguncînin, di alîyê ristesazî û ferhengê de, me hin guherîn pêk anîne, lê me hin tişt wekî ku di berhema resen de hatine, hiştine."

Lêanîna pirtûkê ji hêla Ferhad Mûsa ve pêk hatiye.

# Aramî û rehetiya sîmetriyê

Hunermenda Ingilîz a bi navê Victoria Rose Richards ku bi tekstîlê re mijûl e, bi perspektîfeke ji hewa bi baxçeyên Ingilîzan daketiye û teswîrên xweşik ava kiriye. Ew bi ta û derzî van teswîrên xweşik çêdike. Wê beriya niha jî gelek xebatên bi vî rengî çêkiribû lê vê carê bi awayekî geometrîk van baxçeyan disêwirîne ango dineqişîne.

Rose Richards di sala 2018'an de gava ku qutiya neqşandinê ya diya xwe dibîne hewes dike ku bi vî karî dakeve û tiştên bi vî rengî bikşîne. Wê kifş kir ku ev kar aramiyê pê re çêdike. Paşê jî vî karî pêşda bir û bi



awayekî sîmetrî baxçeyên Ingilîzan ên navdar ji jor ve sêwirand. Weke çavekî ku ji derve li van baxçeyan binihêre sêwirandine van berhemên xwe yên xweşik û xwezayî.Rose Richards ji bo karên xwe dibêje; "Sîmetrî tiştekî xerîb e. Mirovan aramtir û rehttir dike. Sîmetrî dike ku serê min rehet bibe."

Sudoku: Bersiv 22

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 23

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 3 | | | 9 | 5 | 1 | |
| 8 | 5 | | | | | 4 | | |
| | 4 | | | | 5 | 3 | 9 | 7 |
| | | | 1 | | | | | |
| 9 | | | 5 | 8 | 7 | | | 4 |
| | | | | | 2 | | | |
| 3 | 9 | 7 | 2 | | | | 6 | |
| | | 1 | | | | | 7 | 3 |
| | 2 | 5 | 3 | | | 8 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Serê xwe li kêrê disû:**
- Li belayê digere.

**Stêra wî li ezmên nîne:**
- Li belayê digere; ji xwe re nasekine; kumê xwe ji belayê re hidiavêje.

**Tiliya xwe ji çavê wî dernayne:**
- Belaya xwe jê venake; jê nagere; di bin tirsê de dihêle; nahêle çavê xwe veke.

**Xwe bi sîrekê tevlî dikî, bi heft pîvazan jê xilas nabî:**
- Di axaftinê de ti kes pê nikare; mirov nikare xwe bixe belaya wî.

**Ez belav im:**
- Ji bo wî karî ez ne amade me.

**Ez ne li ser hev im:**
- Bi heman wateyê.

**Ez nikarim vî barî hilgirim:**
- Bi heman wateyê.

**Ez ne li xwe me:**
- Bi heman wateyê.

**Kavirên min belav bûne:**
- Bi heman wateyê.

**Ne bi ser hev ve ye:**
- Ne amade ye.

**Serê min ne seqirandî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Ez nizanim ka serê min li ser çi ye:**
- Karê min tevlîhev e; ez nizanim ka çi bikim; hê ne diyar e ka wê rewşa min çawa be.

**Em nizanin serê me li ser çi balîvî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Gotin; kelkelo cihe te li kû ye, got; ba dizane:**
- Nizane ka wê çi bike; giraniya wî nîne; bê bername ye.

**Ji kelemperê re gotin; berê te bi kû ve ye, got; ba dizane:**
- Nizane ka wê çi bike; giraniya wî nîne; bê bername ye.

**Kutilka li ser darê ye:**
- Kengê çi pê were ne diyar e.

**Li ber şek û pekan e:**
- Karê wî ne diyar e; nizane ka serê wî li ser çi ye; karê ku dike ti demana wî nîne; dibe ku sibe ji karê wî derînin.

**Pela payîzan e:**
- Di cihê xwe de nasekine; ka kengê çi bike ne diyar e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Jin hêmana bingehîn ya siberoja Sûriyê ye'




Berdevka Meclisa Jin a PYD`ê Netewî Xemgîn diyar kir ku ji salên 80`ê heya sala 2024`an jinê xwe da îsbatkirin û bû xwedî nasname, heya îro jî berxwedanî û têkoşîna jinan roj bi roj bilindtir dibe û got: "Cihê jinan di Sûrya nû de girîng e."R-2

## 'Çareserî avakirina hikumeteke nenavendî ye'



Riyad Derar diyar kir ku tevahiya gelên Sûriyê nema şer û pevçûnan dixwazin, ew bi hêviya jiyaneke bi aramî û aşîtî ne û wiha got: "Pêwîste hikumeteke nenavendî were avakirin û karibe gelên Sûriyê bi awayekî rast hembêz bike."R-3

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1238 | 12-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Baran dereng ma û erd hîna sor e



Çavkaniya jiyanê ya sereke li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê çandinî ye. Rêveberê Çavkaniyên Avî li kantona Cizîrê Mesûd Mihemed diyar kir ku kêmbûna barana îsal zirarek pir mezin dide çandiniyê û got, "Wê berhemên çandiniya îsal bi sedema kêmbûna baranê kêm bin."R-6

## 'Pêwîste rewşenbîr û hunermend piştgiriya QSD'ê bikin'



Nivîskar Yûnis Bhram da zanîn ku tevî hemû astengiyan lê Şoreşa Rojava di qonaxeke serkeftî de ye. Herwiha bi lêv kir ku pêwîste rewşenbîr, nivîskar û hunermendên kurd bibin piştgir ji QSD'ê re.R-7



**Receb Erdogan çima dilezîne?**
Ahmet Aktaş R-4

# BI RÊXISTINBÛYÎNA CIVAKÊ SERKEFTIN PÊKAN E

Di Rojhilata Navîn de, Sûriyê ji bo tevahiya hêzên cîhanî xwedî stratejiyeke girîng e. Ji ber wê hilweşîna rêjîma Essed û hatina HTŞ'ê li ser desthilatdariya Sûriyê bi pilanên hêzên hegemonîk pêk hat. Dewleta Tirk ku bi dehê salan e hewil dide axa Sûriyê dagir bike, hilweşîna rêjîma Essed wekî feresendekê ji xwe re dît û êrişên xwe yên ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê girantir kir. Li hemberî êrişên dagirkeriyê jî, gelên herêmê rêxistinbûyîna xwe pêş dixin û li derdora hêzên xwe dibin xelek.R-5










## Şêx Alî: Di yekrêziya kurdî de xalên hevpar derdikevin pêş



Sekreteriya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê Mihyedîn Şêx Alî da zanîn ku tevgera siyasî ya kurd di Sûriyê de li ser gelek xalên girîng hatine gel hev û pêwîste bi yek nêrînê di pêvajoya Sûriyê ya nû de beşdar bibin.R-4

# ‘Jin hêmana bingehîn ya siberoja Sûriyê ye’

Berdevka Meclisa Jin a PYD`ê Netewî Xemgîn diyar kir ku ji salên 80`ê heya sala 2024`an jinê xwe da îsbatkirin û bû xwedî nasname, heya îro jî berxwedanî û têkoşîna jinan roj bi roj bilindtir dibe û got: “Cihê jinan di Sûrya nû de girîng e.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Jinên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên di şoreşa Rojava de cih girtin û ji bo mafê xwe û gelê xwe bidest bixin bi salan li ber xwe dan, karîbûn gelek siyasetên li dijî herêmê biguherînin. Gihîşt wê astê ku felsefeya azadiya jinê bû nexşerêyeke nû ji gelên Rojhilata Navîn re. Ji ber vê yekê girîng e di pêvajoya nû de nexşerê û destûreke nû were danîn. Fikrê azadiya jinê û sosyolojiya wê li Sûriyê, Rojhilata Navaîn û cîhanê hatiye belav kirin û wê bi vî fikirî jî Sûriyeke ku parastina maf û çanda hemû ol û pêkhateyan dike bi destê jinê were avakirin.

Di derbarê jin û rewşa heyî Berdevka Meclisa Jin a PYD`ê Netewî Xemgîn ji Rojnameya me re axivî.

Netewî Xemgîn di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Berê di dema sîstema Baas de pergalek ji bo jin tune bû, tenê maf dan ku wekî yekîtiyekî ji xwe re avabikin. Lê ev tenê têrê nake, ji ber ku jin ne kirin beşek bingehîn di Sûriyê de ku di nava civakê de rola xwe bileyze. Di heman demê de rêjîma Baas digot “me mafê jinê daye”, na mafê jin nehatibû dayin, tenê çima xwendin ji jinê re serbedset kirin digotin me mafê jinê daye, maf ne tenê xwendine, ya girîng ku piştî xwendinê wê çawa cihê xwe di nava sazî yan jî di kar û xebatan de bigire. Ji ber ku xwendina destpêkê û dibistan dayike, dayik keça xwe fêrî her tiştî dike, di hemû aliyan de wê perwerde dike. Dewlet ne bi xêra xwe mafê xwendinê dide. Ji ber ku li malê jî mirov dikare xwe fêrî xwendinê bike, lê çima jin mafê wê di nava civakê de hatiye xwarin, bila mafekî wiha bidin ku jin jiyana xwe bibîne, lê mixabin di jiyanê de jin hatiye helandin û tune kirin.”

**‘Jin bingiha civak û jiyanê ye’**

Netewî Xemgîn da zanîn ku pêwîste mafê jinê di destûra nû de were nivîsandin û wiha domand: “Li Sûriyê û li Rojavayê Kurdistanê pêwîstî hate dîtin ku rêxistinek jin were avakirin, ji ber vê yekê ji salên 80`ê ve heya 2024`an di Sûriyê de têkoşîna jinê bi awayekî bê navber dewam kir, ji ber ku jin di destûra Sûriyê de tune bû. Em çawa dibêjin pirsgirêkên Elewiyan, Derziyan, Suriyanan û netewa kurdan heya ku pêwîste çareser bibin, divê di hemî aliyan de were çareser kirin, çi aborî, siyasî û civakî be û di nav de divê jin were qebûl kirin ku wekî rêveberî di Sûriyê de xwe bi cih bike. Jin netewa û ji netewê mezintire, yê netewan dide naskirin, pêşxistin û yê ku civakeke exlaqî, çandî, siyasî û aborî bi awayekî baş û rast dide meşandin, jin e. Her wiha heya ku ev pirsgirêk newin çareser kirin wê alûziya Sûriyê xilas nebe, ji ber vê yekê pêwîste dewleta nû li gor berjewandiyên xwe biryar û destheledariya xwe neke, ji ber îro her kes li ser piyane û daxwaze mafê xwe dikin, bêdengî nemaye, wê ti kes vê sîstemê qebûl neke. Ji ber vê yekê di destpêkê de pêwîste mafê jin di destûra sûriyê de were nivîsandin, ji ber jin bingeha civak û jiyanê ye. Ji salên 80`ê heya sala 2024`an jin xwe da îsbat kirin û bû xwedî nasneme, heya roja me ya îro berxwedanî û têkoşîna jin roj bi roj mezin û bilindtir dibe. Ji ber vê cihê jinan di Sûrya nû de girîng e.”

**‘Pêwîste Sûriyeke Demokiratîk were avakirin’**

Netewî wiha domand: “Nasnameya jin di hemû civakan de hatibû winda kirin, lê em di roja xwe ya îro de dibînin ku jin çawa gavên girîng avêtin û destkeftiyên pir mezin bi serxistin, di heman demê de xwe kir xwedî nasname. Wek di hemû cîhanê de tê xuyakirin ku îro jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yekîtî, partî, sîstema konfediral di çarçoveya demukiratîk de, sîstema hevserok û parastina xwe jî wekî YPJ`ê da avakirin. Her wiha ev di Sûriyê de û bi tayebet piştî ketina Esed ku ev komên tûndirew û îslamî serweriya sûriyê kirin destê xwe û rêveberiya Sûriyê ya demikî ava kirin, ev kom nikarin çareseriyê bi xwe re bînin. Ji ber ku dûrî hişmendiya demukrasiyêne, hişmendiya ku li ser mezin bûne li dijî hemû gelane û ji bona desthilatiyê û berjewendiyên xwe wê her tiştî bikin. Her wiha bi taybet jî hişmendiya wan li dijî jinê ye, ev hişmendî jî wê şerekî pir mezin bi xwe re bîne û aramiyê çênake. Kengî sîstemeke demokratîk were ava kirin wê demê gengaze were qebûl kirin. Ya din jî pêwîste jin di cihê biryaran de be, mîrasekî jinê pir xurt heye, dikare çareseriyê bi xwe re bîne, lê hişmendiya zilamê serdest tu guhertinê bi xwe re nayîne.”

**‘Em meşa xwe ya azadiyê dewam dikin’**

Netewî Xemgîn axaftina xwe wiha qedand: “Niha em wekî jin zehmetiyên ku herî zêde em dikişînin, êrişên li ser xaka me ku ji hindir û derve dibin êriş li ser me tê meşandin. Bi taybet dema em sîstema xwe ya jin avadikin, wekî Kongra Star, Zenûbiya, Mecilisa Bakurê Sûriyê û Mecilisa jin a PYD`ê bi awayekî aktîf bi rêva dibin, li ser me êriş zêdetir dibe. Pêwîste jin di hemû qadan de xwe xurtir bike, di heman demê de sîstema xwe bike modêleke navneteweyî. Her wiha yê ku dibe asteng li pêşiya me jî şer e, ev şerên ku li ser herêm û bajarên me tên kirin, em derfetên heyî hemû didin ji bo parastina xaka xwe û ev jî nahêle ku aramî çêbibe, li gor van êrişan jî em meşa xwe ya azadiyê dewam dikin, dema ku meşa azadiyê dewam be wê astengî tune be. Wek tê zanîn em wek jin di destpêkê de li hemberî zehniyetê şer dikin, piştre jî em şerê leşkerî didin meşandin ku niha bi sedan jin cihê xwe di çeperên şer de digirin û li dijî dagirkeriya Tirkiyê şer dikin, di heman demê de jî serkeftinên herî mezin bi dest dixin. Bê guman pêwîste hemî jinên cîhanê bi me re destek bin û ev destek dayin jî ne ku em daxwaz dikin ev erka hemû jinane ku piştgirî û destekê bidin me.”



# Fatîma Hemîd bi tena serê xwe rêwîtiya têkoşînê dimeşîne

**Fatima Hemîd a 50 salî xwedî du serpêhatiyên ku mirov jê sûdê bigre ye. Aliyekî wê bi hişmendiya mêr û şîdeta baviksalarî re rûbirû maye aliyekî din jî ew e ku bi tena serê xwe rêwîtiya xwe ya têkoşînê didomîne.**

Li dijî êrişên dewleta Tirk a ji Cotmeha 2019’an ve bê navber didome, bi taybetî li Zirgan a Kantona Cizîrê ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jin pêşengiya berxwedanê dikin. Tevî ku çend metre dûrî baragehên leşkerî yên dewleta Tirk in û rojane dengê top û pevçûnan dengê balafiran ji asîmanê wê kêm nabe, berxwedan û têkoşîna jinan her dem ji dagirkeran re bûye tirs. Di nava berxwedan û têkoşînê de gelek çîrokên jinan ên ku nehatine bihîstin hene.

Yek ji jinên dilnizim û rûken ku her kes jê hez dike û xwedî serpêhatî ye, Fatima Hemîd a 50 salî ye, 11 sal in zewicî ye û li bajarê Zirganê dijî. Fatima hê nebûye dayik. Fatima ya ku tevî hevjînê xwe berê di Parka Şehîd Arîn Mîrkan de 7 sal in dixebitî, nêzî 5 sal in bi tenê parkê birêve dibe.

Parka Şehîd Arîn Mîrkan yek ji projeyên Ofîsa Jin a Şaredariya Gel a Zirganê ye ku di salên berî êrişên dagirkeriya Tirk de hatibû vekirin. Fatîma Hemîd der barê rêwîtiya jiyana xwe de ji ajansa me re axivî.

**Ne bû dayik ne jî jiyana hevjîniyê jîya ji ber zihniyeta mêr**

Fatîma Hemîd got ku ew zewiciye lê hevjînê wê nexweş ketiye, paşê hev berdane û berê xwe daye Şamê û got: “Em bi hev re bûn, li parkê me bi hev re kar dikir lê bi hinceta tedawiyê 5 sal e li Şamê ye, ez terik kirim û bi tenê me. Ez roj û jiyana xwe li parkê di nava ken û kêfxweşiya zarokan de derbas dikim û wiha sebra min tê. Nebû qismet ez bibim dayik lê ev hemû zarokên min in û ez wan nebînim sebra min nayê.”

**‘Tenêtî zor e lê fêrbûnê dixwaze’**

Fatîma Hemîd diyar kir ku bi tena serê xwe dijî û têdikoşe û wiha got: “Li malê ez bi tenê dijîm. Tenêtî zor e lê çi bikim ez fêrî jiyana wiha bûme. Jiyana di bin topbaranan de



xeter e lê riyeke din û jiyaneke din jî tune ye ku em bijîn. Li vir jiyan heye û derdora min hemû cîran û nas in û bajar tijî xelk e. Jiyana bi tenêtiya tijî têkoşîn.”

**‘Ez û park her demsal bi hev re ne’**

Fatîma Hemîd behsa lênêrîna li parkê û çandiniya wê kir û wiha got: “Min li vir dest bi her tiştî kir, li vir min bi destên xwe darên ku dirêjahiya wan nedigihîşt 30 cm. Di vê erdê de çand, axa parkê rast kir û min gihayê çêkirî lê çand, dar avdan. Weke her demsalê çawa dar û pel xwe nû dikin, ez jî wiha me, ez û park bi hev re di her demsalê de li ba hev in. Park bûye parçeyek ji jiyana min, mala min û her tiştê min e. Ruxmê xeteriya heyî, ji mala xwe zêdetir ji parkê hez dikim. Me di hundirê parkê de jî kafeterya vekir û parkeke wiha çêbû ku her kes li vir pêwîstiyên xwe dibîne û bûye cihê bêhnvedanê. Lê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker, gelek tişt hatin guhertin û niha zarok bi lîstokên ku mane dilîzin.”

**‘Ez dikarim her karî bikim’**

Fatîma Hemîd wiha pêde çû: “Jiyan tiştekî wiha ye ku tu ne li gorî wê bî wê te têk bibe, ji bo wê ez niha bi tenê dijîm. Kar ji temenê min re nabe asteng, dikarim 20 salên din jî kar bikim. Lê hêvî û xewnên min ew e ku aramî serwer be. Bi hêviya ku ev dagirkerî bi dawî bibe û êdî dengê guleyan ji giştî Sûriyeyê qut bibe. Ji ber vê dagirkiriyê em koçber bûn, bajarên me dagir kirin û malên me hatin wêrankirin.”

**Dawîbûna dagirkeriyê û vegera kombûna jin û zarokan li parkê**

Fatîma Hemîd bal kişand ser vegera kenê li ser lêvên jin û zarokan û wiha got: “Bi hêviya ku dagirkerî bi dawî bibe, careke din ev park şîn bibe û her kes bi ken û kêfxweşî lê kom bibe. Bi hêviya jiyana bê şer ku êdî hestên tirsê nemînin, li şûna wê aramî hebe. Gelek tişt hesret man di dilê min de, xwezî niha keç û kurekî min hebûya. Daxwaza min ji jinan ew e ku jîr û zana bin, tu carî mêr ji xwe re stûn nebînin.”

Fatîma Hemîd di dawiyê de spasiya jinên ku her dem li kêleka xwe dîtine kir û got: “Ji bo saziyên ku heta niha piştgiriya min dikin û xwedî li min derketin, ez gelek spasiya wan dikim. Divê hemû jin jiyanê biparêzin.” **NÛ JINHA**



# ‘Pêwîste rewşenbîr û hunermend piştgiriya QSD’ê bikin’

Nivîskar Yûnis Bhram da zanîn ku tevî hemû astengiyan lê Şoreşa Rojava di qonaxeke serkeftî de ye. Herwiha bi lêv kir ku pêwîste rewşenbîr, nivîskar û hunermendên kurd bibin piştgir ji QSD’ê re.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet li gundewarên Minbic, Bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê ji destpêka ruxandina rêjîma Baas ve berxwedaniyeke bêhempa ji hêla YPJ û QSD’ê ve tê meşandin. Bi vê berxwdaniyê gelek ji çeteyên dagirkeriyê hatin kuştin. Gelên cîhanê vê berxwedaniyê dişopînin. Tevî ku berxwedaniyek dîrokî tê kirin, lê pêwîstiya tevgera siyasî û hêza leşkerî bi xebata rewşenbîrî, çandî û hunerî heye.

Derbarê vê yekjê de nivîskar Yûns Bhram ji rojnameya me re axivî.

**‘Tevî hemû azaran, Şoreşa Rojava di qonaxeke serkeftî de ye’**

Yûnis Bhram diyar kir ku tevî hemû zehmetî û azaran Şoreşa Rojava di qonaxeke serkeftî de derbas dibe û wiha got: “Piştî ruxandina rêjîma Baas û têkçûna Essed, êdî kesên din hatin şûna wî. Em dizanin kesên li Şamê, di bingeha xwe de çeteyên DAIŞ’ê ne, lê divê em ji bîr nekin jî ku piştgeha wan a serke jî Enqera ye. Herwiha nêzî 12 wezîrên ku di hikumeta demkî de hatine destnîşankirin, tirk in. Di heman demê de kesên ku desthilatdariya Şamê dikin hîna jî di



lîstên cîhanî yên terorê de ne. Ji ber vê yekê eger gav bi aliyên Şamê de hatin avêtin, divê em bi zanebûn gavên xwe biavêjin û berî ku ev gav bên avêtin pêwîste em li hêzên navnetewî yên dost vegerin. Tevî hemû êş, dayîna berdêlên şehadetê û azaran, Şoreşa Rojava di qonaxeke serkeftî de ye, serkeftineke ku berî niha pêk nehatiye li Rojava. Niha em xwedî hêzeke leşkerî ya li ser asta navnetewî ne. Rojava tevî êrişên hawirdorê wekî welatekî bi hêz û serbixwe ye û her kes tê de mîna gêrkan xebatê dike. Rojava xwedî petrol, enerjî û gazê ye, lewma jî divê em ji vê hêza xwe piştrast bin û nehêlin ku ev qonaxa pêşketî ji dest here.”

**‘Pêwîste em bibin stûn ji syasetmedar û şoreşgeran re’**




Nivîskarê kurd Yûnis Bhram da zanîn ku divê rewşenbîr, nivîskar û hunermend piştgiriya siyastmedar hem jî şoreşgeran bikin û wiha axivî: “Dema ku civakek doza serxwebûn û azadiya xwe bike beriya wê an jî di nav şoreşê re amadekariyê xwe dike. Rola rewşenbîr, nivîskar û hunermendan ji bo destekdayîna şoreşê gelekî girîng e. Di gelek qonaxan de rewşenbîr û hunermendên me yên kurd ji bo şoreşê xwedî rol bûn. Lê şoreşa ku ji milê rewşenbîrî û hunerî ve hat kirin ne bi qasî şoreşa leşkerî bû. Di baweriya min de hejmareke mezin ji nivîskar, hunermend û rewşenbîr, dîlên berjewndiyên partiyan in. Yan jî hin partiyan rê nedan ku ew bibin xwedî rol û li gorî pêwîstiya şoreşê tevbigerin. Lê tevî wiha jî gavên baş di warê çandî de hatin avêtin. Nemaze, kilîpên ku ji bo berxwedaniya Kobanê hatin amedekirin, li ser asta cîhanî dengvedanek çêkir û cilên leşkerî yên şervanên me bûn tirêndek li gel ewripiyan. Stranên ku Hunergeha Welat vê dawiyê derxistin, bûn huner û çandeke navnetewî, hem jî gelek televiziyonên cîhanî ew stran weşandin. Lewma em nikarin bibêjin ku rewşenbîr û hunermend ne xwedî rol in, lê di vê qonaxa hestiyar de pêwîste em bibin stûnek ji siyasetmedar û şoreşgerên xwe re.”

# Hunera xêzkirinê li ser textan

**Dilovan kêfo/Amûdê**

**Wênsaza ciwan Zeyneb Mûstefa ji zaroktiya xwe ve ji hunera xêzkirina wêneyan li ser depan hez dike. Ew bi rêya vê hunerê hewil dide xêzkirina li ser depan xeyalên xwe derxe holê.**

Hunera niqişandin an jî xêzkirina li ser depan xwedî temenekê pir dirêje. Lê di dema dawiyê de vê hunerê bala gelek ciwanên nûhatî kişandiye ku xwe di vê hunerê de pêş dixin.

Yek i ciwanên ku neqşeyan û wêneyan li ser depan xêz dikin, keça bajarê Amûdê Zeyneb Mustefa ye. Wê ji zaroktiya xwe ve ji hunera wênesaziyê hezkiriye û dema ku mezin bûye xeyalên xwe pêk aniye. Zeyneb Mustefa di sala 2003’an de li bajarê Amûdê jidayik bûye, wê xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li Amûdê qedandiyê, piştre ji ber






hezkirina wê ji wênesaziyê re ew tevlî xwendina peymangiha hunerê beşê wênesaziyê bûye. Piştre wê bi awayekî pispor karê wênesaziyê pêş xistiye.

Derbarê hunera wênesaziyê û bi taybet xêzkirina li ser depan, wênesaza ciwan Zeyneb Mustefa ji Rojnameya me re axivî.

Zeyneb Mûstefa di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Ez pir ji wênesaziyê hez dikim. Min ji biçûkaniya xwe ve ji vê hunerê hez kiriye. Ji ber wê min di temeneke biçûk de dest bi fêrbûna wênesaziyê kir û ez pê ve hatim girêdan. Sedema zû fêrbûna min ji wênesaziyê re heskirina min bû. Mirov bi hezkirina tiştekî dikare xwe tê de pêş bixe. Kesên ku alîkariya min dikirin hevalên min yên herî nêzîk bûn, wan hewil dida hemû tiştên ku pêdiviyên min pê hebin, peyda bikin.

Zeyneb balkişand ser zehmetiyên ku ew rastî wê hatin û got: “Zehmetiyên ku bi min re derbas bû, pirsgirêkên çûn û hatinê bû. Lê belê ev tişt li ber xewn û xeyalên min û hezkirina min ji wênesaziyê re nebû astengî, wênesazî ji min re mîna aşqeke bê sînore ku ez çiqsî ji ava aşqa wênesaziyê vexum jê têr nabim. Cîhan bi xwe mîna tabloyeke bi hemû rengan hatiye xemilandin.”

Hunermenda ciwan Zeyneb Mistefa di derbarê kar û xebatên xwe de wiha got: “Tu rengên min yên taybet tuneye, ez ji tevahiya rengan hezdikim. Lê li gorî hestên ku ez tê re derbas dibim, ez hemû rengan bikar tînim. Wênesazî tu dikarî bibêjî ku çi tiştên di dilê te hemû tiştan tu dikare bi riya wênesazî derxîne holê. Lê belê nexşeyên ku ez zêdetir li ser kardikim û çêdikim nexşeyên rûyên mirovan e. Û ji bo zêdetir karên min bê belavKirin min dest bi karê belavkirina li ser medyaya civakî kir û karên min bihtir hat belavkirin û ez hatime naskirin.”



Şêwekara kurd Zeyneb Mistefa di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ez dixwazim herdem xwe pêş bixim herwiha banga min ji bo her kesê xwedî hêviyekê be ew e, ku li xewna xwe xwedî derkevin û xwe bihtir pêşbixin û ji bona xwe tu astangiyan nasneke û tenê bide dû xewnên xwe, her wiha hêviya min ew e ku em tevahî bi aramî jiyan bikin.”

# ‘Pêşwaziya koçberan erka herkesî ye’

**Hevseroka Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê ya bajarê Qamişlo Sûad Hiso diyar kir ku ji bo pêşwaziya koçberên êzîdî her kes bi rihê berpirsiyartiyê tev digere û destekdayînê pêşkêşî wan dikin.**

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Dagirkeriya Tirk bi awayekî hovane êrişî Şehba, Til Rifet û Helebê kir û gel jî koçber bûn û berê xwe dan herêma bi ewle a Rêveberiya Xweser. Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê hemû hewildanên xwe kirin ku nêzî 300 malbatên êzîdî bicih kirin û pêdiviyên wan pêk anîn.

Di derbarê pêşwazîkirin û bicihkirina koçberên êzîdî yên ku ji Şehba û Heleb hatine herêma Cizîrê hevseroka Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê ya bajarê Qamişlo Sûad Hiso ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebat ji bo koçberên Êzîdî

Sûad Hiso da zanîn ku piştî koçberên Şehba û Heleb carek din koçber bûn û berê xwe dan herêma Cizîrê, Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê û hemû malên Êzîdiyan ên herêma Cizîrê ketin tevgerê û pêşwaziya wan kirin û wiha got: “Me hemû hewildanên xwe kirin da ku destekdayînê bidin koçberan û pêdiviyên wan pêk bînin. Herwiha Êzîdiyên ku di Şehba de mabûn me xwestin hemûyan bînin û li cih û warên Êzîdiyan bicih bikin wek; gundewarên Êzîdiyan li Hesekê, Amûdê û Tirbespiyê. Di heman demê de hin kes hebû bê erebe bûn me di vî milî de jî destek da û erebe ji wan re girtin da ku wan derbasî herêmên Rêveberiya Xweser yên bi ewle bikin. Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê û şaxên wê heya niha nêzî 300 malbatên Êzîdî bicih kirin û xwedî li wan derketin. Bi



hemû defetên heyî cih û bêdivî ji wan re peyda kirin. Raste bûyera hatina wan gelek bi êş bû û miletekî ku du caran li pey hev koçber bibe cihê xemgîniyê ye. Dema di rê de jî bûn rastî gelek kuştin, tecawiz û revandinê hatin. Lê dema didîtin çawa em di xizmeta wan de ne û wan bi heyecan pêşwazî dikin, ew êşa wan li wan sivik dibû. Bi taybet Êzîdî di gelek fermanan re derbas bûne û êşên mezin dîtine. Em rastî wan astengiyên giran nehatin, ji ber em hemû bi yek rihî tev digeriyan. Her wiha Rêveberiya Xweser jî berpirsiyartiya vê yekê girt ser milê xwe.”

### Destekdayîna gel ji koçberan re

Hevseroka Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê ya bajarê Qamişlo Sûad Hiso axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: “Gelek kesên xêrxwaz destekdayîn dan ji bo koçberan ji ber ku cejna Êzîdî jî bû, bi boneya cejnê gelek kes xêra dikin. Di heman demê de bi riya menbera mala Berzan komek hat çêkirin têde dîmen û bûyerên ku koçber rastî wan hatibûn gihandin wan û gelek kesan alîkarî dan. Her wiha Komeleya Pêşerojê ya Merwan Bapîrî, Mala Êzîdiyan li Mindinê, Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê ya li Ewropa, Rêxstina Şitûtgert, Meclisa Sîwana Jinên Êzidî û Mala Êzîdiyan li Filonkis destek dan û heya roja îro jî hîn alîkarî berdewamin. Me ev alîkarî ne tenê li Êzîdiyan belav kirin, lê hin malbatên din jî hebûn hewcedar bûn me xwest em destekê bidin wan jî. Hêviya me ya mezin ew e ku em bighin aramî û aşîtiyekî, ji ber ku rêjîma Baas a desthilatdar hilweşiya, lê hikumeteke demkî hatiye û di şexsê wan de tê dîtin ku ji El-Qaîde hatine. Em wek gelê kurd pêwîste yekrêziya xwe çêbikin, ku bikaribin di hikumeta nû de mafê xwe biparêzin û em azad jiyan bikin. Her wiha vegerin cih û warên xwe li Efrînê.”

# Baran dereng ma û erd hîna sor e

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Çavkaniya jiyanê ya sereke li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê çandinî ye. Rêveberê Çavkaniyên Avî li kantona Cizîrê Mesûd Mihemed diyar kir ku kêmbûna barana îsal zirarek pir mezin dide çandiniyê û got, “Wê berhemên çandiniya îsal bi sedema kêmbûna baranê kêm bin.”**

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê herêma çandinî ye û çandinî jêdera sereke ya debara bi hezaran malbatan e. Rûbera zeviyên bejî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji sedî 75 e. Kantona Cizîrê bi çavkaniyên xwe yên xwezayê wek depoya xurekê ya welat tê naskirin. Kalîteya herêmê çavkaniyên xwezayî wekî av, ax û oksejîn, kêm dibe.

Xweza û axa herêmê ji çandiniyê re baş e. Lê îsal ji ber derengmayîna baranê û kêmbûna wê, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çandinî dereng dimîne. Ev bandoreke neyînî li aboriya herêmê û cotkaran dike. Bi taybetî ziyan li cotkaran pir dibe, ji ber jêdera sereke ya ku debara xwe pê dikin çandinî ye. Zeviyên bejî li ser barana demsala zivistanê ne û yên avî jî li ser ava bîran, bendav û çeman. Lê îsal eger baran weke sala çûyî kêm be, wê zeviyên bejî bêsûd bin. Guhertina avhewayê hişkesaliyê zêde kiriye.

### Kêmbûna qada şînahiyê li herêmê

Serkaniyên tevahî çeman li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ne. Dewleta Tirk ava çeman kêm dike an



jî dibire. Di encama vê yekê de rêjeya ava çem, gol û bendavan ku çavkaniyên çandinî û avê ne, gihaştina astên herî kêm. Ev yek jî rasterast dibe sedema bêkalîtebûna axê û kêmbûna şînahiyê. Di heman demê de polîtîkayên pîşesaziyê dibin sedema aloziya avhewayî û bilindûna pileya germahiyê. Vê jî bandoreke mezin li van çavkaniyan kir. Herwiha kiryarên mirovî yên xirab jî, dibin sedema kêmbûna çavkaniyên xwezayî yên avê. Ji ber wê jî bi kêmbûna qada daristanî û şînahiyê, barîna baranê kêm dibe û ax ber bi colbûnê ve diçe.

Qada şînahiyê li kantona Cizîrê ji sedî 17 ye

Li kantona Cizîrê bendav wek çavkaniyên sereke yên avê tên dîtin. Li kantonê 10 bendav hene. Çavkaniyên tevahî bendavan jî ew çem in ku ji Bakurê Kurdistanê tên û dewleta Tirk kontrol dike. Di bendavan de milyarek û 16 milyon m3 av tê depokirin. Li kantonê golek tenê heye, ew jî gola Xatûniyê ye ku 15 milyon metrekab avê depo dike. Li gorî daneyên Desteya Çandinî û Avdanê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîkî, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê şînahî ji sedî 2-4’ê rûbera giştî ya herêmê ye. Li kantona Cizîrê şînahî ji sedî 17 ye. Herwiha 4 milyon darên fêkî û yên din hene. Di salên aloziyê û dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê de, gelek dar hatin birîn. Heta niha daneyeke fermî nîn e, lê tê texmînkirin ku nîv milyon dar li Çiyayê Kizwanan hatine birîn.

### Kêmbûna ava Xabûrê bandorê li rûberên genim û ceh dike

Kantona Cizîrê beşeke Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku sêyeka wê zuha ye û li pêşberî pirsgirêka şorbûnê re rû bi rû ye. Salane ji 1-2 hezar hektar kalîteya axa wê paş dikeve û ji sedî 85’ê erd di bin gefa çolbûyînê de ye. Çemê Xabûr yek ji çemên sereke yên herî mezin ên li herêmê ye. Li gorî daneyên Gerînendetiya Çavkaniyên Avî ava wî pir kêm bûye. Kêmbûna ava Xabûrê bandorê li nêzî 16 milyon donimên genim, ceh û darên fêkiyan ên li geliyê Xabûrê di herêma navbera kantona Cizîr û ya Dêrazorê de dike. Li gorî daneyên Gerînendariya Daristan û Parastgehan, hejmara darên wekî tû, hejîr û spîndaran gelekî kêm bûye. Gelek ajal jî wek berazên kovî, dirindeyên nêçîrê, masî û xezal êdî xuya nakin.

### Berferhiya zeviyên çandiniyê li Cizîrê 2,33 milyon hêktar e

Li gorî amarên fermî berfirehiya zeviyên çandiniyê li herêma Cizîrê 2,33 milyon hêktar e. Her wiha xaka istismarkirî 1,605 milyon hêktar û rêjeya 68,8 ji xaka herêmê dibe, jê 477 hezar hêktar bi avdana bîran û bendavan tê kirin û berfirehiya xaka bejahî milyonek û 128 hezar û 100 hêktar e.

Çavkaniyan avê li herêmê ji çeman e ew jî jî çemê Xabûr, Ceqceq û Dicle. Golên heyî jî gola Xatûniyê ye û berfirehiya wê 3 km2 . Bendavên heyî jî bendavê El-Basil, bendava 8`ê Adarê, bendava 7`ê Nîsanê, bendava El-Sifan, bendava El-Zexîrê, bendava El-Cîrahiyê, bendava Çilaxa, bendava El-Hekîmê, bendava El-Borzê û bendava Meşûqê.

Hejmara bîrên çandiniyê ya herêma Cizîrê gihaşt 53 hezar û 108 bîr, jê 21 hezar û 215 bîr istismarkiriye, jê 143 hezar û 252 hêktar tê av dan, lê bîrên din ne mustesmirin ji ber sedemên girêdayî rewşê.

### Baran dereng maye û erd hîna sor e

Her sal di dema çandiniyê de cotkar dest bi karê xwe yê çandiniyê dikin û li hêviya hatina baranê dimînin, lê dema baran nebare û zevî bejî be cotkar bê hêvî dibin. Îsal jî baran ne bariyaye û erd hîna sor e.

Derbarê kêmbûna Baranê û bandora wê li ser çandiniya sala 2025’an Rêveberê Çavkaniyên Avî li Kantona Cizîrê Mesûd Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

Mesûd Mihemed diyar kir ku îsal baran dereng ma û wiha got: “Îsal barîna baranê dereng maye, zirara wê jî li ser çandiniyê mezin, zirara wê jî ew e ku genim, ceh û nîs berê serê salê derkeve baştire, ji ber qeşa zirarê naghînê. Barana ku heya niha hatiye nêzî 50 milîmî ye, ji ber ku çend caran baran bariya lê rêjeya wan 5 an 6 milî bû, tenê barana dawiyê ku bariya 16 milî bû. Zirara ku îsal li çandiniyê hatiye geleke, dema ku baran li ser çandiniyê di demê xwe tê, ew çandinî rehê xwe vedide, lê îsal heya niha şînahî hîn derneketiye, ev yek tenê bandor li zeviyê bejî nekiriye, di heman demê de li yên avî jî dike. Wê demsala îsal a çandiniyê ji sedî 30-40 zirarê bibîne.”

### Demên gunçaw ji bo çandinî û çinînê

Mesûd Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de demên gunçaw û baş ji bo çandiniyê anî ziman û wiha got: “Demên baş ji bo çandiniyê ew e ku di 15 Mijdarê ye, dibe ku hin cotkar berî vê demê jî dest pê bikin, mîna herêmên aliyên Başûr ew ji 20 Cotmehê dest bi çandiniyê dikin, ji ber ku çandinî li wê herêmê bi lez çêdibe, herwiha çinîn wan herêman jî zû tê çinîn, jêre tê gotin istiqrara 5’emîn û 4’emîn. Lê li deverên din yên xeta 10 ku jêre istiqrara yekê û 2 wan tê gotin di 15 Mijdarê dest bi çandiniyê dikin û 20 Gulanê çinîna ceh dest pê dike, piştre ya genim tê kirin.”

### ‘Wê berhemê çandiniya îsal bi sedema kêmbûna baranê kêm be’

Mesûd Mihemed axaftina xwe wiha qedand: “Li kantona Cizîrê ji sedî 10 zeviyên bejî derneketiye, piştî vê demê jî ku derkeve gelek dereng ma, di heman demê de berhemê îsal ê çandiyê wê kêm be. Şînahî incex di meha Çile an Sibatê derkeve, ji meha Sibatê heya dema çinînê ku di meha Gulanê de ye, gelek bandoriyên xwe hene, mîna germbûn û sermbûnê.”



# ‘Çareserî avakirina hikumeteke nenavendî ye’

**Riyad Derar diyar kir ku tevahiya gelên Sûriyê nema şer û pevçûnan dixwazin, ew bi hêviya jiyaneke bi aramî û aşîtî ne û wiha got: “Pêwîste hikumeteke nenavendî were avakirin û karibe gelên Sûriyê bi awayekî rast hembêz bike.”**

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Di çaroveya rewşa heyî ya li Sûriyê tê qewmandin û hikumeta nû a Sûriyê, Çîgirê Desteya Rêveberiya Mecilsa Sûriya Demokiratîk Riyad Derar pirsê rojnameya me bersivand û hevpevîn wiha bû:

**-Piştî ruxandina rêjîma Baas`ê gelek tevlîhevî li hemû Sûriyayê dereket, ji bilî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi nêrîna te wê rewş ber bi ku ve biçe?**

Ez bawerim ev telîheviya ku niha li Sûriyayê tê qewmandin, sedema wê lawazbûne ewlehiyê ye û di heman demê de ev kesên ku niha rêveberiya Sûriyayê dikin di aliyê ewlehiyê de kêm û lawazin, nikarin Sûriyê bi ewlehê û aramî bi rêve bibin. Ev koma ku Şam bi destxistin, berê di Idlibê de xwe bi cih û rêxistin kiribûn. Em dikarên bêjin jî ku ev kom, komekî dixwaze tolhidanê bike û di navbere pêkhateyan de ferq û cudahî çêbike, herwiha ji bo berjewandiyên gel tev nagerin, her ji bo berjewandiyê xwe tevcdigerin. Gelek kes di nav koma HTŞ`ê de hene bi zagûn û mafê gelan nizanin, hete zanebûna wan di têkiliyên civakê de lawazin. Ev yek jî dibe sedem ku tevlîhevî were çêkirin û aramiyê ji hole rakin. Ji ber vê yekê ferqekî pir mezin heye di navbera ewlehiya Şamê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, ji destpêka şoreşê ve Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye birêxistinkirin di hemû aliyan de. Hêzên ku detpêkê li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kir û li gor mafê hemî pêkhateyan tevgeriya hezên QSD, YPJ û YPG`e bûn, bi hemû berxwedanî û îradeya xwe şer kirin, tenê ji bo ku çeteyên DAIŞ`ê herêmê dagir neke û gelê herêmê nedin pişaftin. Hêzên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû hezekî qezanckirinê ji bo gelan. Di heman demê de civak jî bi ewayekî rast û bi rêxistinkirî rêve birin, her pêkhateyek jiyana xwe bi rengekî azad dijî. Yanî heya ku şoreşek were biserxistin wê zor û zehmetî pir bin. Herwiha tevlîhevî jî wê zêdetir be, di rojek û mehekê de ev tevlîhevî çareser nabe, niha Sûriyê xwe ji nû ve dide avakirin û ew jî demek jê re dive ku bi rengekî rast were avakirin.

**-Heya çi astî sîstema Rêvberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikare bibe nimûne ji bo tevahî Sûriyê?**

Sîstema Rêveberiya Xweser a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstemeke ku her kes dixwaze li hemû Sûriyê were pêkanîn, ji ber ku sîstemeke demokiratîk û ji bo berjewandiyên hemî pêkhateyan kar û xebat dike. Lê ji ber hin kesên bi zehniyeta nejedparat û cihê xwe li Sûriyê girtin ku bi navê îslamî destheledarî û hukimê xwe dide meşandin, eynî zehniyeta ku di buhare Ereban de hat meşandin. Dibe ku ev zehniyet têk biçe an jî ev koma ku niha rêveberiya Şamê bi awayekî demkî bi rêve dibe helwişe, ji ber ku ev zehniyet zehmeta ku were qebûlkirin, di heman demê de gelek tişt di bin navê îslamê feriz dikin. Hîn hikumê Sûrî bi awayekî fermî ne girtine, em dibînin ku çiqas li ser destên wan komkujî pêk tên. Bê guman helweşîne vê zehniyetê wê ne hesan be û wê gelek şerê giran û dijwar jî were destpêkirin, helbet xilaskirina ji zehniyetekî wiha wekî ev komên ku Şam bi ser xistin, wê ne hesan be û demek jê re dive. Em şer û pevçûn naxwazin her em jiyaneke bi aramî û aşîtî dixwazin, em dixwazin bi riya destûrê mafê her pêkhateyekê bigihîjiyê. Ji ber ku ne rehete ku dîsa şer û bi rengekî dijwartir were destpêkirin, di heman wextî de dewletekî ne navendî were avakirin û hikumet karibe gelê Sûriyê bi awayekî rast hembêz bike û pêwîste hikumeta nû a Sûriyê sûd ji sîstema Rêveberiya Xweser werbigire, ji ber hemî pêkhate di nava xwe de hewand û her pêkhateyek li gor ol û baweriyên xwe bi azad jiyan dikin. Her hêviya me ew e ku sala 2025`an de ev qirîz û alozya li Rojhilata Navîn tê qewmandin, bi dawî bibe.

**-Helwestên dewletên herêmî û navdewletî ji hikumeta nû çi ye?**

Ji bo nêzîkatiyên dewletan bi Sûriyê re yan jî wê çawa nêz bibin, li gor ku ez dibînim yê herî zêde ji pêvajoya Sûriyê sûd bigir û bandora wê li ser komê ku niha Sûriyê bi rêve dibin, Tirkiya ye. Ji ber ku tirkiyê xwe kiriye nava Sûriyê de û destê xwe jê bernade, di heman demê de dewleta Tirk şandeyên xwe şandin Sûriyê ji bo ku cihê xwe baş li Sûriyê bigre, bi hikumetekî ku niha bi rengekî demkî li şamê rawistiya ye û heya niha di lîsteya terorê de ye, tirkiya diwaze bi wan re pêşniyarê xwe bike û hevaltiya xwe bi wan re xurt bike, gor em dibînin ku heya niha Tirkiye desthiledariya xwe li Sûriyayê dide meşandin û sûd jê digire. Di heman wextê de wê HTŞ`ê di bin xizmete Tirkiyê de tev bigere û gor berjewandî û desthiledariya xwe wê hikum bidin meşandin. Hin dewletên nêz wekî Îraq û Ordin nêzî rewşê bû tenê ji bo ku zanîbin wê çi bibe û çi derfet hene ku çi ji vê rewşa niha sûd bigirin, di kêleka wê de jî riya danûsatndinê û têkiliyan ji xwe re veke. Her wiha em dibînin ku heya niha dewletên Ereb ne hatiya serdana Colanî û pîrozbahî jî ji bo Colanî ne şandiye, di heman demê de hikumetekî wekî Colanî qebûl nakin, ew jî dizanin ku xeteriyek heye û bi taybet di vê rewşa niha de ku tiştekî zelal tune ye, rewşekî ne zelal û bi nakokî ye; Colanî heya niha di lîsteya terorê de ye û ti hakimiyeta wî li ser hikum wê tune bê, zehmet tê dîtin ku kesek wek Colanî gelê Sûriyê bi rêve bibe, ji ber vê yekê dewletên Ereb xeteriyekî mezin li Sûriyê dibînin. Zehniyeta ku Colanî li ser mezin



bûye ku bi navê îslamî û rêbazê komkujî û ne edalet ku dide meşandin, wê di nava gelê Sûriyê de newe qebûl kirin. ev jî wê şer û pevçûnên pir mezin bi xwe re bîne, wê ji rêjîma Baas xirabtir be, wê ti çareseriyê bi xwe neyinê. Ji ber vê yekê tişte yekem ku were kirin pêwîste zehniyeta Colanî were guhertin, di heman demê de pêwîste di aliyê tîpên xwe yên şexsî de jê guhertin cêbikin da ku karibe gel hembêz bike. belê em dibînin hin dewletên derve şandeyên xwe rêkirin Şamê da ku nas bikin HTŞ`ê wê karibe bi erka rêveberiya Sûriyê ve rabe an na, heya niha ti biriyar ne hatiya derxistin û tiştek di derbarê vê mijarê de jî zelal tune ye. lê wek dîtina min ez dibêjim; ji bo çareseriya qirîza Sûriyrê pêwîste hemî pêkhate yek bin û mafê her kesî bi jiyanekî azad bijî, destheledarî tune be ji ber dema ku di dewletekî de destheledarî tune be û mafê her pêkateyek were dayin wê ti astengî û zehmetî li pêşiya xwe nebîne. Em bi hêvîne ku Sûriya bibe Sûriyayeka Demokiratîk û azad.

# ‘Hovîtiya li dijî Êzidiyên Efrînê dewam dike’

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Hevserokê Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê Mistefa Nebi’o diyar kir ku dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê 19 cihên pîroz yên Êzîdiyan rûxandin û bi gelek awayan kurdê Êzidî işkence dikin.**

Di derbarê kiryarên ku li dijî Êzîdiyan li Efrîna dagirkirî ji aliyê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ve tê kirin, hevserokê Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê Mistefa Nebi’o ji Rojnameya me re axivî.

### Kiryarên li dijî Êzidiyan

Mistefa Nebi’o da zanîn ku ji destpêka dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê yên ku di bin navê islama radîkal re êrişî Efrîn kirin di sala 2018’an de yekser êrişê gundên Êzîdiyan kirin û wiha got: “Di pilana wan de



hedefgirtina Êzidiyan sereke bû, kîna wan bi giştî kurdan re heya bi taybet Êzîdî. Piştî dagirkeriya Efrînê çeteyên dewleta Tirk berê xwe dan pîrozgeh û şûnwarên Êzîdiyan û ew rûxandin. Dema Êzidî koçber bûn ji sedî 15 tenê man di Efrînê de, ji ber ku kal û pîr bûn û hin ji wan jî dev ji xaka xwe bernedan. Piştî dagirkirinê rojane li ser destê çeteyan rastî binpêkirinan dihatin. Em herdem dibêjin çawa DAIŞ li Şengalê ferman li ser Êzidiyan rakir, jinên wan revandin û birin bazarê firotin û cihên pîroz rûxandin. Heman şêwazê ku DAIŞ meşandî, dakirkeriya Tirk û çeteyên wê di Efrînê de jî berdewam dikin.Dihat diyarkirin ku ji yek hizir û yek nêrînê ne ku dixwazin Êzidiyan tune bikin çi li Şengalê be û çi jî li Efrînê be. Piştî ku Efrîn dagir kirin bi çend rojan, kesayetek bi navê Omer Şemo di gundê Qîvarê de ji ber ku şehadeta islamî negot, ew bi xwîneke sar bi guleyekî kuştin. Gelek keç û jinên me binçav kirin û bi mehan di zindanan de hiştin û hin kes heya niha jî çarenûsa wan ne zelal e.”

### Bêdengiya saziyên Navdewletî

Nebi’o di dwama axaftinên xwe de wiha got: “Yekîtiya Êzîdiyên Efrînê piştî ku koçberî Şehba bûn me hemû kiryarên dagirkeriyê û çeteyên wê belge kirin. Me karîbû vê dosiya bighînin destê saziyên navdewletî, di heman demê de bi riya komîteya azadiya olan di kongra Emrîkî de ev dosiya hat pêşkêşkirin û di kongrê de bi seatan nîqaş li ser hat kirin. Lê mixabin hertim berjewendiyên navdewletî bandor dikin. Di heman demê de me wêneyên dergehên xwe yên pîroz jî xistibûnê ku dema berê çawa bûn û niha piştî dagirkeriyê çawa ne. Mirovên ku hatin kuştin bi wêne û dîroka kuştina wan, her demekî hin kes direvandin û pere ji malbatên wan dixwestin. Bi giştî me karîbû em van kiriyaran bighînin raya giştî, lê mixabin dema mijar dibe kurd û bi taybet Êzîdî berjewendyên dewletan derdikevin û ev yek dibe asteng li pêşiya misogeriya mafê me. Heya niha jî tu dadgeh di derheqê dewleta Tirk û çeteyên wê de çênebûye. Hîn jî di Efrînê de binpê kirin berdewame, ew hişmendiya wan ya kuştin, talan kirin û revandinê hîn heye bi taybet komên çete yên bi navê Hemzat û Emşat.”

Hevserokê Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê Mistefa Nebi’o dawî li axaftinên xwe anîn û wiha got: “Daxwaza gelê Sûrî bi giştî ew e ku bi azadî û wekhevî bijîn. Gelê Sûrî ji bo jiyanek bi azad û bi rûmet gelek temen da û bi taybet jî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Daxwaza me ew e ku Netewên yekbûyê bêdeng nemîne li hember kiryarên ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê di derheqê netewan de dike û li hember wê bi helwest be. Vê destdirêjiya dewleta Tirk bi sekinîne û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev re jiyan dikin û dixwazin bihevre wek gelên resen yên herêmê bimînin. Metirsiya me ew e ku heger dewletên Navnetewî piştgiriyê bidin vê hikumetê û mafê Kurdan û yê Êzîdiyan misoger nebe ev xeteriyeke. Daxwaza me ew e ku her netew û her olek wek xwe jiyan bike.”

# Şêx Alî: Di yekrêziya kurdî de xalên hevpar derdikevin pêş

Sekreteriya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê Mihyedîn Şêx Alî da zanîn ku tevgera siyasî ya kurd di Sûriyê de li ser gelek xalên girîng hatine gel hev û pêwîste bi yek nêrînê di pêvajoya Sûriyê ya nû de beşdar bibin.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Qonaxake nû di giştî Rojhilata Navîn û bi taybet di Sûriyê de hatiye destpêkirin. Di vê pêvajoya nû ya ku ji 8 ê Berfenbara sala 2024'an ve hatiye teysandin de, dîroka lehengiya gelê Kurd ya ku ji 14 salan ve tê nivîsandin xwedî hebûn û bingeheke xurt di nava ev geşedanên ku tê de çarenûsa gelê Sûriyê ya pêşerojê dide diyar kirin de heye. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û modêla demokrastiyê ya ku di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatiye dîzayînkirin, muhra xwe li raya nevnetewî û Sûriyê xistiye û xwedî îrade bû di veguhartina gelek riyan de, yek ji wan jî parastina cîhana ku ber bi serweriya zihniyeta DAÎŞ ê ve diçû bû, her wiha avakirina modêl û hişmendiya demokrasî û azadiyê care yekem di Rojhilata Navîn û cîhanê de, her wiha dengvedana doza gelê Kurd him di Sûriyê û him jî di raya giştî de ku Kurd hene û êdî nayên înkar kirin.

Li ser vê bingehê êdî dem dema hevgirtina gelê Kurd û dest bi xebatê yekparabûna xwe di xaka Sûriyê de bê kirin. Ev yek jî bi insiyatîv û gavavêtinên gelek xurt di nava hemû Partiyên Siyasî yên Kurdî de hatiye destpêkirin. Têkildarê yekrêziya gel û partiyên Kurdî di Sûriyê de Sekreteriya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê Mihyedîn Şêx Alî li gel rojnameya me axivî.



Ji xwe herêmên Kurdî bi giştî yên weke Efrîn, Serê Kaniyê, Girê sipî, Kobanê û hwd ji êrîş û kiryarên hovane nehatin veqetandin, çi DAÎŞ dibe çi jî komên Çeteyên ku xwe di Sûriyê bi rêxistin kirine. Desthilatdariya Baas ya borî nikarîbûn li xwe vegeriyane û di serhişkiya xwe de berdewam kirin, pişta xwe dabûn Îranî, Hizbullah û Rûsiyan, weke ku wê bibe desthilatdarê ebedî ji Sûriyê re."

**Pêvajoya nû ya Sûriyê û desthilatdariya Rêjîma Baas**

Mihyedîn di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku ji 8'ê Berfenbara 2024'an ve Sûriyê ketiye qonaxeke nû û wiha got: "Sûriye ji 8'ê Kanûna yekem ve ketiye qonaxeke nû, ev yek jî bi hatina hêzên HTŞ'ê bi serkêşiya Colanî (Ehmed El Şeraa) û derbasbûna wî ji hemû parezgehên Sûriyê re, bi vê yekê re Sûriyê kete nava desthilatdariyeke nû. Niha di nava ev guhartina herî mezin de 61 sal ji desthilatdariya Essed da pêçandin û li şûn xwe hêşt. Di ev 61 salên derbasbûyî de, tu qenûnên partiyan û yên rojnamevaniyê nebûn ku tê de rûmet û azadiya xelkê Sûriyê bê parastin. Yanî tu hilbijartinên paqij yên ku tê de îradeya gelan bê derxistin nebû. Her wiha di van 14 salên bûrî de kirîza Sûriyê destpê bû û Sûriyê careke din di saya Partiya El Bass de bi milyonan gelê Sûriyê koçber bû û Sûriyê hate xira kirin. bi hezaran kesayetên Siyasê û xwedî nêrîn bê dadgehî hatin girtin.

**Piratîka HTŞ'ê wê bê çavdêrî kirin**

Mihyedîn wiha berdewamî da axaftina xwe: "Lê guhartinên dawiyê yên ku ji nedîtî ve hatine kirin. Guhartinekî diramatîk bû. tişta ku me dîtiye û bê ku were ziviranidin, derbasbûna HTŞ ê ji hemû axa Sûriyê re, mirov dikare bêje ku tu qetlîamên mezin nehatin çêkirin û bi zirareke herî kêm weke ku me çavdêrî kiriye ev desthilatdariya nû li ser hemû bajarên Sûriyê control bû. Bê guman me jî ev yek weke gaveke erênî dît, yanî saziyên fermî yên dewletê hatin parastin û destdirêjî li jinan û gelê sivl nehate kirin. lêdereya HTŞ ê hin daxuyaniyên ji bo Kurdan jî dan ku Kurd beşekin ji gelê Sûriyê û wê hevparbin di pêşeroja Sûriyê de. her wiha tekezkir ku beriya 1400 sal kê kî kuştiye û çi bûye; tu karê wan pê nîne û ne sûcê xelkê Sûriyê ye. Di ragihandina xwe de ev yek tekezkir. Lê bê guman ev yek ji aliyê cêhanê ve wê di bin kontirolê de be, ka wê di piratîk de wê çawa tevbigere. Piştî wê bi demekê li Urdinê li Bajarê Eqebê Konfiransek bi beşdarbûna YN, dewletên Ereban, Wezîrê derve yê Emrîkî û gelek aliyên din hate lidarxistin, ew biryar û encamnameya ku ji wir derketiye, ew biryarin gelek girên û sereke bûn ji bo pêşaroja Sûriyê da ku çavdêrî li kiryarên ku di Sûriyê de bê kirin bin".

**`Divê Tevgera siyasî ya Kurd li hev du rûnin û li hev bikin`**

Şêx Alî bal kişand ser yekrêziya Kurdî û girîngiya wê di dema heyî de û wiha domand: "Mijara yekriya Kurdî bê guman her tim di rojeva me de ye û ne gavekî nû ye, lê ji 8 ê Kanûnê û vir de ve ketiye qonaxekî nû. Eger ev mijar berê carekê pêwîst ûû girîng bû, niha du caran pêwîste û girîngtir e. ji lewra hêjaye tevgera Sûrî ya Kurd li hev bibanin û li hev bicivin her wiha diyalogan pêş bixin. Bila guhartin di nêrînan de hebe, bila pêşniyar û têgînên nû derkevin tu pirsgirêk tune ye. Lê ger li hev du necivin ew gava ku nayê qebûl kirine. Bila kesayetên serbixwe, civaka sivîl û rojnamevan jî bila hebin. Em Kurd weke beşek ji vê axê û dewletê em çi dibînin, çawa dinirxînin û çi ji me tê xwestin. Tevgera Siyasî ya Kurd divê li hev du rûnin, bê guman tiştên hevpar di nava hemû aliyan de hene li hev du bikin û rewşa heyî xweşik bê şîrovekirin û li ser wê esasê em tevbigerin. Ev wê bibe gava herî girîng di yekrêziya gotara Kurd û yekrêziya nûnertiya Kurd de û lê bibin xwedî".

**`Hebûna gelê Kurd di destûra Sûriyê ya nû de bê nivîsandin`**

Şêx Alî di berdewamiya axaftina xwe de hebûn û nebûna gelê Kurd di Sûriyê de nirxand û wiha pê de çû: "Di ev serdema nû de divê hebûna gelê Kurd weke pêkhate di Sûriyê de bê nîqaşkirin. Kurd bi neteweya xwe ku weke beşek ji gelê sûriyê heyanî niha jî nehatiye naskirin (Înkarkirina hebûnê) hatiye kirin, di destûrê Sûriyê de hebûna Kurdan weke maf nehatiye naskirin û pênasekirin.

Tevgera siyasî ya Kurd xwedî dîrokeke zêdetirê 67 salî ye, bi hezaran girtiyên siyasî ji bo xwedîderketina li netew û zimanê xwe hatine girtin. Ne tenê di dema Essed de, têkoşîna gelê Kurd di Sûriyê de xwe disipêre salên dur û dirêj. Li ser vê bingehê tiştê ku were piratîkikirin çi ye. bi awayekî fermî hebûna gelê Kurd di Sûriyê de bê erêkirin. Zimanê Kurd li rex ziimanê Erebî bibe elfebeyeke bingehîn. Divê tevgera siyasî ya Kurd jî bi yek xîtabê derbasî Şamê bibin".

**Hewildanîm yekrêziya Partiyên Siyasî berdewam e**

Şêx Alî girêdayî ku yekrêziya Kurdî gihîştiye kîjan astê wiha got: "Hewildanên Yekrêziya Partiyên Siyasî yên Kurd her wiha kesayetên serbixwe, rewşenbîr û civaka sivîl heyanî niha nehatine bidawî kirin û hîn jî berdewam e. Lê beşa herî mezin ji civaka Kurd di Sûriyê de li hev e û xwedê bandor û helwest e. bi giştê daxwaz ew e ku ev yekrêzî bibe serûber û şênber be. Bê guman wê astengiyên li pêşiya van xebatan jî bê derketin û her wê derkevin, lê hêviyên me mezin in".

**`Serketina Yekrêziya Kurdê dikeve xizmeta hemû gel û pêkhateyên Sûriyê`**

Şêx Alî destnîşan kir ku serketina yekrêziya Kurdî dikeve xizmeta hemû pêkhate û netewan û wiha domand: "Derkeftin û bidawîbûna diyaloga Kurdî Kurdî dikeve xizmet û yekrêziya hemû gel û pêkhateyên di Sûriyê de, çi li Sûriyê dibe çi jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibe. Dema ev gav bi şîwazê ku tê xwestin pêş bikeve wê demê wê bikeve xizmeta gelên Ereb û ya diyaloga Sûrî Sûrî. Di vî warî de bê guman destkeftî hene li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yek ji wan jî Hêzên Sûriya Dermokratîke HSD ê ye ku niha cavê cêhanê hemûyan lê ye. her wiha hebûna ewqas meclîs û rêveberiya Xweser û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ku di siha vê Rêveberiyê li vir Kurd, Ereb û hemû ol û bawerî bi hev re jiyan dikin. di vê herêmê de pevçûnên nijadperestî û yên netewperestê derneketine holî, ew jî helbet di saya rêveberiya heyî de ye. Bê guman kêmasî jî hene lê çendî hebin jî ewqas hebûna wê girînge di herêmê de û ev hevsengî daye avakirin û atmosfereke aram û aşîtiyane hatiye teysandin".

**HSD ê Hêza ku nayê înkar kirin**

Sekreteriya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (PYDKS) Mihyedîn Şêx Alî wiha axaftina xwe bidawî kir: "Li gorî ku em jî dişopînin û me di hevdîtinan de dîtiye gelek xalên hevpar yên erênî hene. Nimûne piraniya mutlaq ji aliyên heyî hebûna HSD ê weke hêzeke Kurdî werê dike û diparêze, piraniya mutleq li Fermandarê Giştî yê HSD ê Birêz Mazlûm Ebdî weke sembûlekê dibînin li berketiyê hemû pêkhateyan e. Ev tiştên heyî ne û têne qebûl kirin, bê guman ev hêz jî li hember ewqas hêzên teror şer kirine da ku aramniyê, wekhevî, parastina mafê jinan pêk bînin. Ev rastiya me di Sûriyê de ye û nayê înkar kirin.

Bê guamn em aşîtiya Sûriyê dixwazin û divê rê li pêşiya kesî neyê xetimandin. Çendî Şam jî di xêr û xweşiyê de bê, emê jê di başiyê de bin".



## Receb Erdogan çima dilezîne?

**Ahmet Aktaş**

Li ser hilweşandina rejîma-dewleta Sûriyeyê, di serî de DYEyê, heme hema bi giştî dewletên hegemonên cîhanê ketine nava hewldanên ku, para xwe ji vî laşê erdê bistînin û bêgûman hemû jî bi lez dixebitin. Belê ne bi ecêba dewleta tirk. Hema hema hemûyan, ji şêwazên leşkerî pirtir, giranî dane ser rê û rêbazên siyasî û diplomatik.

Lê dewleta tirk a di bin fermandariya 'Sultan' Receb Erdogan de ye, ji hemû demên berê pirtir, bi taybetî li dijî destkeftiyên gelê Kurdistanê, giranî daye êrîşên qirkerî û talankerî. Bêgûman bi hilweşandina pergala Birayê xwe Beşar Esed re, bi çavbirçîbûn û çavnebariyek hîn mezîntir êrîşî destkeftiyên Şoreşa Rojava dike.

Ne bi tinê hêzên leşkerî kiriye armanc, hema hema mirov dikare bêje hemû gel xistiye ber armanca xwe û êrîşî hemû sazî û desgehên jiyanî yên rojane û demdirêj hemûyan dike. Tê bîra me êrîşa dijî mirovahî ya li ser Elokê, ku çavkaniya herî giring bû ji bo jiyana gelê cezîrê! Nuha ne bi tinê av, êdî hemû navendên hewcedariyên jiyana gel jî, mîna Bendava Tişrinê û hwd.kiriye armanc û bi hemû hêza dewletî êrîşan dajo ser.

Gelo çima ewqas lez daye êrîşên xwe?

Jiber ku dizane û dibînî ku ji mijarên siyasî û bûyerên giring ên li herêmê diqewîmin, bi piranî ew ji derve tê hiştin, ew weke aktorê van projeyan nayê dîtin.

Mînak; salekê berî hilweşandina dewleta Sûriyeyê, projeya IMEC(Korîdora Aborî ya Hindistan-Rojhilatan Navîn-Ewrûpa) a ku bi pêşengiya DYEyê û Israilê; ji Hindistanê derbasî Rojhilata Navîn dibe, bi endamtiya Siûdî û Mirgtiyên Erebên Yekbûyî wê çûbûya Ewrupayê, Turkiye ji derveyî vê projeyê hiştin.(xwedêgiravî TR jî, li dijî vêya bi Iraqê re projeya Rêya Pêşketinê çêkiribû)!

Her wiha di 9.1.2025 de, ji bo çareserkirina pirsgrêka Suriyeyê, li Romayê, wezîrên derve yên Fransa, Almanya Inglistan û DYEyê dicivîn, lê Receb Erdogan disa li derve hatiye hiştin.

Îca Receb, van hewldanên tecrîda xwe dibîne û êdî, tirsa wî ne tinê bêpar mayîna ji xenimeta Sûriyê ye, ditirse ku desthilatiya 'Sultantiya' wî jî hilweşe. Lewma ewqas bi lez ketiye nava êrîşên bêsînor û da ku berî Trump were ser desthilatiyê û aramî li Suriyeyê pêk were, hema karibe çi bi dest bixe, ew jê re qezenc e tevdigere û êrîşên xwînxwarî yên bê ûjdanî dajo ser gelê me û bi taybetî destkeftiyên Şoreşa Rojava!

Wisa diyar e ku dostê herî nêzî xwe dibîne Mesrûrê Berzanî ye, hema bi lez ji nişkave ew kişand Enqereyê. Her wiha di heman rojan de ENKSê jî, çû Erbîlê ba Mesûdê bavê Mesrûr! Li aliyê din di heman rojan de John Bass ê şêwirmendê siyasî yê Wezîrê Derve yê DYEyê li Enqerê ye!

Hilbet van geran hemû bi hev ve têkildar în û ji gerên berê em nas dikin, gûman heye ku ne ji xêrê re bin. Belê divê neyê jibîr kirin, tirsa Receb Erdogan a herî mezin jî, ji pêşkeftina deskeftiyên gelê Kurdistanê yên ku di çarçova felsefe û siyaseta Rêber APO de bi pêşengiya Tevgêra Azadiyê ve tê meşandin e.



# Civaka ku xwe di nav aloziyê de birêxistin kiribe ewê serbikeve

Rojnamevan Stêrk Gulo diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze Sûriyê bike weke wîlayeteke xwe û li ser vê bingehê osmaniyeke nû ava bike û wiha got: "Çareseriya aloziyên Rojhilata Navîn li Îmraliyê ye."

**Amara baran/Qamişlo**

Drbarê rewşa Sûriyê, êrişên domdar yên dagirkeriya Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha girîngiya hevdîtinên DEM Partî bi Rêber Apo re, rojnamevan Stêrk Gulo ji rojnameya me re axîvî.

**'Geşedanên ku li Rojhilata Navîn pêşdikevin li ser Sûriyê jî bandor dike'**

Stêrk Gilo anî ziman ku welatê herî zêde ji geşedanên li Rojhilata Navîn bandor dibe Sûriyê ye û wiha domand: "Êrîşên ku di 27 Mijdarê de qewimîn û guhertinên mezin ku pêk hatin, bi plan û bi hewildanên hêzên derve bû. Piştê şerê Îsraîl û Hemasê wek gavên yekemîn bû, ji bo guhertina pratîk û hişmendiya ku îro li Rojhilata Navîn li gor dîzayna nû çêbikin ket meriyetê. Lewma xwestin baskên Îranê bi rêya Hizbûllaha Lubnanê bişkînin. Di heqîqetê de şerê desthilatdariyê di navbera Îsraîl, Îran, Rûsya û Emerîka LI Rojhılata Navîn pir eşkere ye. Ew şerê ku tê meşandin ji bo ku çixarên Îsraîlê û hêzên hegemon di hundirê Rojhilata Navîn de biparêzin. Polîtakaya ku îro ew hêz giraniya xwe didinê û teşeya ku jê re dîtine di rêya pêşketina Îslama Siyasî a îqtîdarê de ye ku dewleta Tirk bi rêya desthilatdariya AKP û MHP'ê 24 sal in li ser wê berdewam dikin. Ji xwe bingeha wê ew e ku



bikaribin dîzayna Rojhilata Navîn û dewletên netewperest li gorî wê ji nû ve dîzayn bikirin. Statûya ku dibêjin Rojhilata Navîn ya nû ango ya mezin di vê çarçoveyê de dixwazin sînor bê guhertin, herwiha guhertinên demografîk li gor wê bê çekirin."

**'Sûriye xwedî stratejiyeke girînge'**

Stêrk Gulo wiha domand: "Di Rojhilata Navîn de Sûriye xwedî stratejiyeke girînge, ji ber ku ew di sînorê xwe yên rojhilat ve cîranê Tirkiyê ye, aliyekî de jî cîranê Urdinê û Îsraîlê ye. Îsraîl ji Şamê ve 15 kîlometre dûre û hekîmiyeta xwe li ser Colan û Quneytera dike. Li başûr û rojhilatê Sûriyeyê gelek pêkhateyên dirzî, elewî û xiristiyan tê de dijîn. Di wê xetê de Îsraîl wek coxrafîk jî pêş de hatiye. Rewşa Sûriyê ku îro gelek bajarên girîng dibin dagirkeriyê de ne ev jî dihêle ku Sûriye di parçebiyînekê de jiyan bike. Hişmendiya ku îro mûdexeleya rejîma Baas bi vî şêwazî kir ku di rojekî de HTŞ'ê ku berê di lîsteya terorê debû, serokê wî yê ku bi navê Ebû Mihemed El Colanî tê naskirin ev guhertineke ku lihev bedilandine, ji ber ku rejîm jî hêzên derva jî divî aliyî de tu helwest nîşan nedan. Hêzên koelîsyonê û Rûsya di gelek cihan de cih girtine, îtîfaqa ku li pişt masê tê kirin ne diyare. Di bin navê ku ew dixwazin Sûriyeke demokratîk çêbikin, îstîqrara Sûriyê xiradikin. Dewleta Tirk dixwaze Sûriye bike wek wîlayeteke Tirkiyê ku li ser vî esasê osmaniyeke nû ava bikin, peymana Adenê a 1998'an ku hat çêkirin, bingeha xwe ji vê digre. Îro dixwazin bakur û rojhilatê sûriyê bi tevahî dibin gefa dagirkeriyê de dihêlin ku bi vî re parçebûna Sûriyê û guhertina demografî dikin. Daxuyaniyên rayederên dewleta Tirk jî vê dide nîşandan."

**'Sûriyê heremeke pirreng e'**

Stêrk di direjahiya axaftina xwe de wiha got: "Rewşa Sûriyê ji dewletên din cûdatire, ji ber ku pirreng e û ji şoreşa 19 Tîrmehê û heta roja me ya îro, li Sûriye û li Bakur û Rojhilatê Sûriye yê şoreşa gelan li pêşe, ku xwe bi rêve dibe û hêza xwe ya xweser û sîstema xwe ya ku xwe dispêre hevpeymana cîvakî çêkiriye. Berxwedana ku li hemberî dagirkeriyê tê meşandin nîşaneya wê ya herî mezine. Heta niha di Sûriyê de rastiya dengeyên siyasî diyar nebûye. Lê hewildaneke mezin heye ku Sûriye ber bi parçebûnekemezin ve neçe. Pêwîstiya Sûriyê bi avakirina sîstemeke ne navendî heye di vî mijarê de bangawaziyên Rêveberiya Xweser û hêzên parastinê çêbûn ku ji bo parastina yekparebûna Sûriyê pêwîstiya wê bi rêveberiyeke demokratîk û ne navendî heye, bingeha wî li ser hevpeymana ku civak ava bike wê bibe. Heta niha di meriyetê de ye, Bakur û Rojhilatê Sûriyê de pêk tîne û dixwaze bibe modela çareseriya Sûriyeyê. Dewleta Tirk a dagirker di bin navê destwerdana hundirê Sûriyê de û di bin navê avakirina komên din de ku îro li Til Rifet, Efrîn, Serê Kaniyê, Şehba û Girê Sipî kiryarên dermirovî dikin ew hêzên ku dagirkerîya axa Sûriyê dikin, nikarin bibin çareserî ku Sûriyê razî bike."

**'Civaka ku xwe di nav kaosê de birêxistin kiribe ewê serbikeve'**

Stêrk wiha domand: "Rêber Apo dibêje ku "Civaka ku di nava kaos de xwe bi rêxistin kiribe ew ê serbikeve. Di 27'ê Mijdarê de me dît ku tevahî Sûriye ewqas guhertinên zehmet jiyan kirin, lê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi ewle bû. Li Helebê gelek însan bi kuştin û qirkirinê re rû bi rû man. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber ku civak xwe parastibû, ewle ma. Bi pêşengtiya jinan civak li derdorê hev bû hêza parastinê. Dema ku hişmendiya netew dewlet şikest, gel demokrasî û azadî xwest, piştî 60 salî ew bixwe îradeya xwe diyar bikin. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo çareseriyê hewildanê xwe parastinê pêşxistin, gel ji heft salî heta heftê salî di nava seferberiyê de ne da ku Sûriyeke demokratîk ava bikin."

**'Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser bingeha konfederalîzmê gel tekoşînê dike'**

Rojnamevan Stêrk Gulo axaftina xwe wiha qedand: "Tekoşîna ku ev 27 salin Rêber Apo di Îmraliyê de dide meşandin û tekoşîna tevgera azadiyê û gelê kurd da meşandin encamek wiha bi xwe re anî. Ji bo Tirkiyê, Îraq, Îran, Sûriyê û ji bo tevahî Rojhilata Navîn ji aloziyê xelas bibe, pêwîste demildest tecrîd bê rakirin û azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk were. Reber Apo dibêje ku "Eger desthilatdar bihêlin, pirsgirêka gelê kurd û Tirk pirsgirêka kurd û ereban dikarim çareser bikim û dikarin wek berê bihev re di nav jiyan konfederal de bi hevdû re jiyan bikin. Ji ber ku dîrokeke dem dirêj a wan gelan bi hevdûre heye".

Çawa ku îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hemû netew bi hev re li eniya Qereqozaq û bendava Tişrînê de mil bi mil kurd, ereb, xiristiyan, herwiha jin û mêr bi hev re berxwedanê dikin û li ber xwe didin, ew jî tê wateya bingeha konfederaliyê."

# Hêviya gel yekrêziya kurdî ye

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**Kesayetê navdar yê olî û rûspiyê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Dr. Murşid Xiznewî bibîrxist ku ev dem ne demê derbasbûye ye, û di heman demê de wiha got; " Hêza girtina mafên gelê Kurd di yekgirtinê re pêkan e."**

Piştî hilweşandina Rejîma Baas hikûmetek demkî ya bi rêveberiya wê bi piranî HTŞ'ê û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk pêktên hat avakirin. Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ji bona Kurd bikarin mafê gelan biparêzin û nûnertiya gelan bikin di nava hewildanek mezin de ne. Komxebatên yekrêziyê û civînên gel tên çêkirin û nêrînên gel tên girtin.

Derbarê xebatên ji bona yekrêzî û hevgirtina gelê Kurd ku tê meşandin û rista kurdan ya di nav Sûriya pêşerojê de, Kesayetên navdar yên olî û rûspîyê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Dr. Murşid Xiznewî ji rojnameya me re axivî.

**'Emê hewildanên xwe yên ji bona yekrêziyê bidomînin'**

Dr. Murşid Xiznewî diyar kir ku serdemeke nû li Rojhilata Navîn ava dibe û pêwîste kurd biryarekî xurt bidin û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Di meha Berfanbara 2024'an de serdemeke nû ava bû. Rojên li pêşiy me rojên dîrokîne û ji nûve têne nivîsandin. Pêvajoya em tê re derbas dibin gelê Kurd dibe alîkar û piştevaniyê ji bona avakirina Sûriya nû tê dayin û ancax sistema Netewa Demokratîk ji bona tevahî Sûriyê riya çareseriyêbe. Lê mixabin Rêxistin û partîyên me yên sîyasî ne yekin û nêrînên wan ji hev cûda ne û bi hevre ne yekin. Ev dê bibe sedem ku dema gotûbêjên di aliyê pêşeroja Sûriyê tevahî de werin kirin, qelsbûn û lawazî di navbera aliyan de were jiyan kirin. Ev wisa berdewam bike dê metirsî di nava civaka Kurd tevahî de çêbibe. Ji bona yekrêzî jî xebatên me di asta partiyên sîyasî û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî pêkhateyan cihê xwe di nav da digirin didom e. Di çarçoveya goftûgoyên heman mijarê de, li gel rêvebirên ENKS'ê jî nîqaş hatin meşandin. Nêzikbûnên wan erênî bûn, lê hin nakokiyên siyasî jî hebûn û hêviyên xwe ji bona derbaskirina wan di dema pêş de anîne ser ziman. Pêwiste civaka me bibe yek û Tevgera me ya sîyasî jî piştgirî bide vê yekê. Kar û xebatên xwe yên li gel hikûmeta demikî wê çawa bimeşînin li ser wan mijaran civînên gel amade bikin û nêrînên hemû aliyan bigirin. Ev pirsgirêkên di navbera aliyên Kurdî de, em dikarin di navbera hev de bi nîqaşên erênî çareser bikin. Astengiyên herî mezin danûstandinên kurdî-kurdî ne. Nûnerên Tevgera Kurd dikarin piştî çareseriyê li Kobanê, Qamişlo û Efrînê wan pirsgrekên xwe çareser bikin."

**'Hêviyên me xurtin û dê xebatên me jî berdewam bikin'**

Dr. Murşid got wek rûspiyekî û kesayetekî oldar ji bona yekrêzî û yekîtiya Kurdan çi erk bikeve li ser milê wî dê pêk bîne û axaftina xwe wisa domand: "Wek gelê Rojavayê Kurdistanê me pir ezmûn bi dest xist. Dema ku em li dîrokê meyze dikin, serhildan û şoreşên Kurdan di demên berê de dest pê kirin e, gelek şoreşger û kesayetên serhildêr di nava civaka Kurd de derketin û ji bona mafên xwe bidest bixin gelek têkoşîn dane meşandin. Di van serhildanên ku hatine meşandin, Kurd her tim ji ber xiyanet û neyekbûna di nav wan de têk çûn. Bi demekê nêrînên min hatin guhertin û çapemeniya şerê taybet ya bi navê ORÎENT di wê demê di hevpeyvînekê de navê min wek kesayetên oldar yên piştgirî dide şoreşa Sûriyê derbaskir. Li dîjî desthilatiya Baas û piştgiriya şoreşa Rojava min xebat kirin. Ji ber ku di wan demên şoreşê de em ne yek deng bûn, me ne dikarî destkeftiyên xwe ji milê fermî ve bidin pejirandin. Em bi tevgera xwe, bi xebatên xwe ve hêza herî bingehîn ya Rojhilata Navîn û cîhanê ne. Ji ber em nedibûn yek dijminê me ji vê yekê sûd werdigirt. Pêwîste ji bona dîrok xwe dubare neke, em di pêşeroja Sûriyê de bibin xwedî maf û em yekrêzî û yekîtiya xwe pêk bînin."

**'Nakokiyên siyasî bila nebe asteng pêşiya serkeftina Kurdan'**

Dr. Xiznewî bibîrxist ku ev firsendeke dîrokî ye, em nekin qurbanê nakokiyên kesayetî, siyasî û wiha axaftina xwe qedand: "Di sala 1957'an de yekemîn



partiya siyasî li Rojavayê Kurdistanê hat damezirandin. Bi rihê welatparêzî û niştîmanî hemû kurdên li Rojava piştgrî daan wê tevgerê û gelê Rojava wek rêveberî û nûnertiya xwe radestî destê wan kir. We çi pêşniyar û nêrîn dan gel we pêşwazî kir û pejirand. Ji ber wê hûn û em deyndarê gel in. Nakokî dê bib e sedem ku em di cihê xwe de bimînin û tu gavan pêşde navêjin û gelê me jî wê vê rewşê qebûl neke. An hûnê li cem gelê xwe bin û nûnertiya wî bikin, an jî hûnê bibin sersebebê ku destkeftiyên bi xwîna hezarê şehîdan hatiye avakirin ji holê werin rakirin. Bi serkeftinên ku li ser erdê pêkhatine û destkeftiyên ku me bi dest xwe ve anîne, hêviyên me hêzên me yên parastinê QSD'ê dêne, herwiha kar û xebatên ku ji bona yekîtiyê cihê şanazî û keyfxweşîyê ne. Em bangî ENKS'ê jî dikin bila dest ji nakokiyên xwe berdin û tevlî komxebatên PYNK'ê bibin."